Rônahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :447 nameronahi@gmail.com 14- Îlon - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Welatî diherikin Sûka Pêncşemê

Li bajarên herêma Cizîrê gelek sûkên gelêrî yên heftane hene. Her sûkek navê xwe ji rojên hefteyê digire. Ji ber peydebûna hemû pêdiviyên malê û bi buhayên guncaw, welatî pêdiviyên xwe ji van sûkan peyde dikin. Sûkên gelêrî li herêmên Bakurê Sûriyê ji ber peydebûna hemû pêdiviyên malê û bi nirxên guncaw bala welatiyan dikişîne. Her sûkek navê xwe ji rojeke hefteyê digire.

Li bajarê Hesekê li gorî rojên hefteyê sûk tên vekirin. Sûka Pêncşemê ji kevntirîn sûkên bajarê Hesekê ye. Sûk li taxa El-Kelasê tê vekirin. Dîroka sûkê vedigere destpêka salên 90'î. Di destpêkê ve hemû firoşkarên sûkê ji bajarê Reqayê bûn, ji ber wê bi navê 'Sûka Reqawiyan' dihat naskirin. Hejmara wan hêdî hêdî kêm bû û li beramberî wê hejmara firoşkarên Hesekê zêde bû.





Firoşkarê bi navê Ebû Malik tê naskirin, ji navçeya Dirbesiyê ya girêdayî kantona Hesekê ye û firoşkarê herî kevn ê sûkê ye.

Têkildarî mijarê Ebû Malik wiha got: "Berê me sûk nas nedikir. Lê piştî geşbûna sûkên gelêrî di nav welatiyan de, bi nav û deng bûn û bû çavkaniya rizqê bi sedan kesan. Ji ber guncawbûna buhayê kelûpelan, welatî berê xwe didin vê sûkê."

Ebû Malik diyar kir ku hemû pêdiviyên malan li sûkê hene û buhayê wan jî guncaw e.

Firoşkarên bi navên Esad Mihemed û Muhened El-Konadar diyar kirin ku tevgera kirîn û firotinê li sûkê pir baş e û destnîşan kirin ku gimruka girêdayî rêjîmê û hin komên çeteyan li ser madeyan ji Sûriyê bacan ferz dikin, ji ber wê nirxê hin madeyan buha ye.



Welatiya bi navê Fewziya Feraman a ji taxa El-Eziziyê diyar kir ku buhayê madeyan li sûkê guncaw in û ew dihêle welatî bêtir serdana sûkê bikin.

Têkildarî heman mijarê welatiya bi navê Itîhad El-Ilwan ku ji Dêrazorê koçber bûye û li bajarê Hesekê bi cih bûye, diyar kir ku ew her tim serdana sûkê dike û ji ber erzaniya sûkê mesrefa wan kêm bûye...*ANHA*

# Çemê Çomanê ji bê hişyariyê qirêj dibe





Ji ber sedema ne hişyarî û ne parastina hikûmeta Herêma Kurdistanê jîngehê rûbarê Çoman qirêj bûye. Qirêjbûna rûbar bandorek neyînî li ser ziraet û jiyana welatiyan dike.

Rûbarê Çoman rûbarê herî mezin ê herêma Balekayetî ya ser bi parêzgeha Hewlêrê ye. Çavkaniya ava rûbar ava baranê, helîna berfa çiyan û ava kaniyan e. Ev rûbar tenê li navçeya Çoman re derbas dibe û dikeve li ser rûbarê Zê yê Mezin. Welatiyên navçeya Çoman ji ava rûbar sûd digirin. Ava rûbar ji bo ziraet û vexwarinê bikar tînin.

Herwiha yek ji sedemên geştyar serdana herêma Balakayetî dikin ev rûbar e. Niha ji ber nebûna hişyariyê rûbarê Çoman qirêj bûye. Sedemê qirêjbûnê jî, hebûna hejmarek benzînxane û îstasyonên kirîn û firotina gazê yên li nêzî rûbar in. Herwiha ji aliyê welatiyan ve avêtina bermahiyane. Qirêjbûna rûbar metirsî li ser jîngeha navçeyê û jiyana welatiyan çêkiriye.

Berpirsê Parka Naşinal Helgurd Sekran ku projeyekî geştyariye li Çoman, Bextiyar Behcet eşker kir ku ji bo geştyar berê xwe bidin Çoman rûbar girîng e û wiha got; "Li herêma Çoman, gelek rûbar û çavkaniyên avê hene. Lê yê herî girîng rûbarê Çoman e. Ev rûbar çavkaniya jiyana welatiyan e. Ji derveyî çavkaniya ava ji bo ziraetê û vexwarinê, ji bo balkişandina geştyarin ji girîng e."

Bextiyar Behcet eşker kir ku ji bo paqij hiştina rûbar divê gel û hikûmet alîkariya hev bikin.

Akîtîvîstê jîngehê yê herêma Balekayetî Karox Elî bal kişand ser hewldanên paqijkirina rûbar û got; "Çend caran bi dildarî me hewl da rûbar ji naylon û tiştên pilastîk paqij bikin, lê dîsa salane qirêj dibe. Ji ber ku nayê parastin. Lewma divê şaredarî û aliyên peywendîdar ji bo parastina rûbar biryarên tûnd bidin."

Qaymeqamê Çoman Ehmed Qadir bal kişand li ser hewldanên pêşîlêgirtina qirêjkirina rûbarê Çoman û wiha got; "Me gelek hewl daye ku rûbar paqij bihêlin, ji bo vê ji me çend kargeh girtine ku ziyan didin rûbar. Herwiha me hemû benzînxane û kargehên nêzî rûbarin agadarkirine ku ji rûbar dûr bikevin. Em daxwazê dikin ku ji bo parastina rûbar alîkariya me bikin."...*ROJNEWS*

Rônahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 447 14- îlon- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Azadiya Ocalan azadiya gelên Rojhilatanavîn e



Berpirsê Partiya Yekitiya Suryan li bajarê Hesekê Gabriel Şamûn tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kir û destnîşan kir ku Ocalan rêberekî netewî ye, ji bo azadiya hemû gelan tekoşînê dike, bi azadkirina Ocalan hemû gelên Rojhilata Navîn wê azad bibin. Şamûn bang li rêxistinên mafê mirovan kir ku ji bo azadiya Ocalan bikevin nava tevgerê.*R-4*

# JI EFRÎNÊ HETA ÎDLIBÊ ÇALAKÎ

**Di van rojên dawiyê de li Efrînê çalakiyên li dijî dagirkeran zêde bûne. Şervanên Yekîneyên Parastina Gel derb li ser derbê li leşker û çeteyên dagirker didin. Çeteyên ku derbên giran dixwin tirs û xof ketiye hundirê wan û ji Efrînê direvin.**



## ÇALAKÎ WÊ BERDEWAM BIKIN

Odeya Çalakiyan ya Xezeba Zeytûnê bi daxuyaniyeke nivîskî da xuyakirin ku şervanên wan 11'ê Îlonê li dijî çeteyê bi navê Amîr El-Qetî yê girêdayî koma El Cebhe El-Şamiye çalakiyek kirine û çete hatiye kuştin. Odeya Çalakiyan ya Xezeba Zeytûnê soza tolhildana ji dagirkeran dubare kir û got: "Wê çalakiyên me di serî de li Efrîn û heta Idlib û Ezazê dewam bikin." Her wiha hat ragihandin ku şervanên YPG`ê bi operasyoneke taybet, serçeteyekî DAIŞ`ê yê paye bilind û bi eslê xwe ji Îtalayayê, girt. *R-2*

## DAGIRKER DERBÊN GIRAN DIXWIN

Ji aliyê din ve Navenda Ragihandin û Çapemaniyê ya Yekîneyên Parastina Gel YPG'ê bi daxuyaniyekê encamên çalakiyên xwe yên dawî yên li Efrînê eşkere kir. YPG'ê diyar kir ku di çarçoveya pêngava duyemîn ya Bexwedana Serdemê li Efrînê de hêzên wan li hemberî artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê rêzeçalakiyên bibandor pêk anîn. YPG'ê destnîşan kir ku di çalakiyên wan ên li herêma Efrînê de herî kêm 3 çete hatine kuştin û gelek çete jî birîndar bûne. *R-5*

## Bê şer pirsgirêka Îdlibê çareser nabe



Endamê Komîteya Têkiliyên Karê Derve yê KCK'ê Serhed Varto diyar kir ku bê şer pirsa Îdlibê çareser nabe û got, "Daxwazên Rûsya, Îran û Tirkiyeyê ji hev cuda ne. Rûsya dixwaze rejîm li gelemperiya Sûriyê serwer bibe." Varto da zanîn ku Tirkiye wê li pêşberî Îdlibê bixwaze li xeta Efrîn û Cerablûsê hebûna xwe bidomîne, lê wê ev yek pêk neyê." Her wiha Varto da zanîn ku ger siyaseta Tirkiye li Îdlibê bi ser neket, wê siyaseta wê ya li EfrînÊ jî pêşve neçe. *R-4*

## QSD'ê sê jinên Êzidî rizgar kir

Di 3'ê Tebaxa 2014'an de çeteyên DAÎŞ'ê êrîşî Şengalê kir. Di encama êrîşê de bi hezaran jin revandin. Heta niha hê jî aqubeta gelek jinan nayê zanîn. Hêzên Sûriya Demokratîk 3 jinên Êzidî yên din ji destên DAIŞ'ê rizgar kir. Jinên ku hatin rizgarkirin li Xanesorê ji aliyê TAJÊ ve radestî malbatên wan hatin kirin. *R-3*

## PE şewata li Kurdistanê şermezar kir



Şewata daristanên li Dersim û cihên cuda yên Kurdistanê ku ji aliyê hêzên dewleta Tirk ve tên kirin, li Parlementoya Ewropayê (PE) bi sernavê 'Şewatên daristanan ên li herêmên Kurdan ên li Tirkiyê' bû rojev. Komên siyasî yên li Parlementoya Ewropa'yê, şewata daristanan şermezar kirin û daxwaz kirin ku li hemberî hikûmeta Tirk nerazîbûn bûn nîşandan. *R-5*

## PDK'ê rê neda ku em beşdarî hilbijartinan bibin




Tevgera Azadiya Civaka Kurdistan bi daxuyaniyekê diyar kir ku ew weke partiyek fermî ji aliyê Hikûmeta Iraqê ve hatine qebûl kirin lê Hikûmeta Herêmê, bi taybetî jî PDK'ê rê nedaye ku ew beşdarî hilbijartinên 30`ê Îlonê bibin. Tevgera Azadî da zanîn ku ew di hilbijartinan de piştgiriyê nadin ti partî û rêxistinan, ew ê piştgirî bidin namzetên welatparêz û demokrat. *R-5*

## Yekîtiya Ereban xwest Tirkiye ji Iraqê derkeve

Wezîrên Karê Derve yên Konseya Yekitiya Ereb roja sêşemê cara 150'î li hev civiyan. Civîn li Kahîreyê bi lîdertiya Wezîrê Karê Derve yê Sûdan Muhammed Ehmed, pêk hat, Di civînê wezîrên karê derve yê 17 welatan amade bûn. Konseya Yekîtiya Ereban, daxwaz kir ku Tirkiyê kir hêzên xwe ji Iraqê vekişîne û xwe têkelî karê navxwe yê Iraqê nekin. *R-5*

## QSD hêza niştimanî ya Sûriyê ye



Fermandarê giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Mazlûm Ebdî derbarê pêşketinên dawî yên li Bakur-Rojhilatê Sûriyê ji Rojnameya El Heyat re axivî. Mazlûm Ebdî diyar kir ku di qonaxa dawî a Pêngava Bagera Cizîrê de Hecîn wê were rizgarkirin û paqijbûna giştî rojhilatê çemê Firatê ji terorê wê were ragihandin. Ebdî got, "Bi derbasbûna sala 2019'an re hemû herêmên me wê rizgarkirî bin." Her wiha Mazlûm Ebdî desnîşan kir ku QSD hêzeke niştimanî ya Sûriyê ye û erka wê parastina gel û sînorên Sûriyê ye. *R-4*

## Dewleta Tirk cebilxaneyê ji çeteyan re dişîne

Dewleta Tirk a dagirker li hember operasyona Rûsya û hêzên rêjîmê ya li dijî Idlibê çek û cebilxaneyê ji komên terorîst ên li wê derê re dişîne. Hat ragihandin ku karwanekî leşkerî yê artêşa Tirk di rêya korîdora Kefer Losîn a sînorê bakurê Idlibê re derabasî Sûriyê bû. hat gotin ku karwan ji tank, çekên din û lojîstîkê pêk dihat. *R-2*

# Wê çalakî Efrîn heta Îdlibê dewam bikin

**Odeya Çalakiyan ya Xezeba Zeytûnê bi daxuyaniyekê nivîskî da xuyakirin ku şervanên wan 11'ê Îlonê li dijî çeteyê bi navê Amîr El-Qetî yê girêdayî koma El Cebhe El-Şamiye çalakiyek kirine û çete hatiye kuştin. Odeya Çalakiyan ya Xezeba Zeytûnê soza tolhildana ji dagirkeran dubare kir û got: "Wê çalakiyên me di serî de li Efrîn û heta Idlib û Ezazê dewam bikin."**



Odeya Çalakiyan ya Xezeba Zeytûnê bi daxuyaniyekê ragihand ku şervanên wan li navçeya Reco ya Efrînê çeteyê girêdayî koma El Cephe El-Şamiye yê bi navê Amîr El-Qetî kuştine.
Odeya Çalakiyan ya Xezeba Zeytûnê bi daxuyaniyekê nivîskî da xuyakirin ku şervanên wan 11'ê Îlonê li dijî çeteyê bi navê Amîr El-Qetî yê girêdayî koma El Cebhe El-Şamiye çalakiyek kirine û çete hatiye kuştin.
Di daxuyaniyê de Odeya Çalakiyan ragihand 11'ê Îlona 2018'an ku li ser rêya navçeya Reco ya Efrînê li dijî çeteyê El Cebhe El-Şamiye yê bi navê Amîr El-Qetî çalakiyek kirine û di çalakiyê de hatiye kuştin.
Her wiha Odeya Çalakiyan ya Xezeba Zeytûnê soza tolhildana ji çete û hêzên dagirker ên Efrîn û Bakurê Sûriyê dagirkirine dubare kir û got: "Wê çalakiyên me di serî de li Efrîn û heta Idlib û Ezazê dewam bikin."

### YPG'Ê SERÇETEYEK GIRT

Ji aliyê din ve hat ragihandin ku şervanên YPG`ê bi operasyoneke taybet, serçeteyekî DAIŞ`ê yê paye bilind û bi eslê xwe ji Îtalayayê, girt.
Tê payîn YPG`ê daxuyaniyekê derbarê mijarê de bide raya giştî.

## Dewleta Tirk cebilxaneyê ji çeteyan re dişîne



Dewleta Tirk a dagirker şandina cebilxaneyê ji çeteyan re didomîne, her wiha şer di navbera hêzên rêjîma Sûriyê û çeteyên DAIŞ`ê de li Tilûl El-Sefa didome.
Li gorî çavdêran karwanekî leşkerî yê artêşa Tirk a dagirker di rêya korîdora Kefer Losîn a sînorê bakurê Idlibê re derabasî Sûriyê bû. Karwan ji tank, çekên din û lojîstîkê pêk dihat.
Dewleta Tirk a dagirker li hember operasyona Rûsya û hêzên rêjîmê ya li dijî Idlibê çek û cebilxaneyê ji komên terorîst ên li wê derê re dişîne.
Ji aliyê din ve hat ragihandin ku şer li gundewarên Şamê yê nêzî sînorê parêzgeha Siwêdayê di navbera çeteyên DAIŞ`ê û rejîmê de didome. Şer li herêma Tîlal El-Sefa pêk tê.
Li gorî Navena Çavdêriyê ya Mafên Mirovan a Sûriyê, li herêmên ku şer lê didome metirsî li ser jiyana 30 zarok û welatiyên ku ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve hatine revandin, heye.

## Cenazeyên 3 pêşmergeyan di gora komî de hate dîtin



Li navçeya Hewîce gorek komî hat dîtin. Di gora komî de nasnameya 3 pêşmergeyan hat dîtin. Daxwaz ji malbatan hat kirin ku biçin cenazeye zarokên xwe wergirin.
Li gorî çavkaniyek ji nava hêzên Iraqê, di dema lêgerîn û lêkolîna şûnmayên çeteyên DAIŞ'ê de, gorek a komî nêzîkî navçeya Hewîce ya ser bi parêzgeha Kerkûkê hat dîtin. Çavkaniyê diyar kir ku di nava cilên cenazeyan de hinek nasname jî hatine dîtin û ji wana 3 jê nasnemeyên pêşmergeyên hikûmeta Herêma Kurdistanê ne.
Li gorî çavkaniyê, gor ji aliyê Tûgaya 56 a Heşdî Şebî ve hatiye dîtin û li gorî agahiyan her sê perşmergeyên cenazeyê wan hatîn dîtin ser bi tugaya 4 a Wezareta Pêşmergeyanin.
Çavkaniyê da zanîn ku pêşmergeyên cenazeyê wan hatin dîtin di sala 2015'an de li gundê Wehede yê ser bajarokê Daqoqê ketine destê çeteyên DAIŞ û hejmara wan 8 pêşmerge bûn. Herî dawî çavkaniyê diyar kir ku di nava wan pêşmergeyan de 2 fermandar jî hebûn, lê tenê cenazeyê 3 pêşmergeryan hatiye dîtin.

## QSD`ê nasnameyên şehîdên Bagera Cizîrê eşkere kir

Navenda Ragihandinê ya QSD`ê nasnameyên 5 şervanên ku di qonaxa dawî a Pênagava Bagera Cizîrê ya bi navê "Şerê Tunekirina Terorê" de şehîd bûn, eşkere kir.
Navenda Ragihandinê ya QSD`ê bi daxuyaniyekê nasnameyên şervanên xwe yên şehîd bûne eşkere kir. Di daxuyaniyê de hate gotin QSD`ê Pêngava Bagera Cizîrê ji bo rizgarkirina baregehên dawîn ên çeteyên DAIŞ`ê ji nû ve dest pê kir.
Hate destnîşankirin ku bi pêşveçûnê re û di encama teqîna mayineke çeteyên DAIŞ`ê de 5 şervan şehîd bûn.
QSD`ê di daxuyaniya xwe de soza xwe ya li hemberî rêhavalên xwe yên şehîd nû kir û diyar kir ku wê heta dawiyê şopdarên rêya wan bin.



## Artêşa tirk êrîş kir sê sivîl birîndar bûn



Di encama topbarana artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê li ser navçeya Til Rifet de, sê sivîl birîndar bûn.
Artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê navçeya Til Rifet a kantona Şehbayê topbaran kirin.
Di encamê de, sê sivîl birîndar bûn. Yek ji wan navê xwe Xesan Seydo Mamiş yê 32 salî ye.
Birîndar li nexweşxaneya Avrin a li navçeya Fafîn a kantona Şehbayê têne dermankirin.

## Tirkiye û Îranê bi hev re êrîşî Biradostê kirin

Tirkiye û Îranê bi balefir û topan bi hev re li herêma Bradostê ya Başûrê Kurdistanê dan.
Dewleta Tirk bi balefirên şer herêma Bradostê bomberdûman kir û rejîma Îranê jî bi hawanan li herêmê da. Herdu êrîş di heman wextê de pêk hat.
Rejîma Îranê Şemiya borî baregeha PDK-Î û ya HDK'ê ya li bajarê Koyê ya Hewlêrê bomberdûman kiribû. Dewleta Tirk jî her roj Başûrê Kurdistanê bomberdûman dike û li vê derê leşkerên wê yên dagirker hene.





# Ezê li nirxên hunermendên şehîd xwedî derkevim

**Gerîlayê HPG'ê Delîl Tolhildan diyar kir ku ew dixwaze xeyalên hunermendên şehîd pêk bîne û da zanîn ku erka wî ew e ku li nirxên wan hunermendan derkeve. Delîl got, "Li çiyayên Kurdistanê hemû xeyal dikarin bi cih werin anîn."**

Delîl Tolhildan ku beriya şoreşa Rojava di nav xebatên çand û hunerê de bû diyar kir ew dixwaze xeyala hevrêyên xwe yên şehîd pêk bîne û got, ''Peywira min e ku ez li nirxên Hozan Mizgîn, Şehîd Sefkan afirandine xwedî derkevim''.
Yek ji gerîlayê HPG'ê Delîl Tolhildan 1995'an li Bakurê Sûriyê li Hesekê ji dayik dibe. Tolhildan beriya Şoreşa Rojava ya 19'ê Tîrmehê di nav xebatên çand û hunerê de cih digire, ji 2014'an û vir de li çiyayên Kurdistanê hem gerîlatiyê û hem jî doktoriyê dike.
Gerîlayê HPGê Tolhildan çîroka xwe ya ji Bakurê Sûriyê dest pê dike û digihije Zapê wiha dibêje: "Malbata min ne welatparêz bû. Hevalên min ên dibistanê bi huner û çandê re mijûl dibûn, wêne çêdikirin. Ez jî di 11 saliya xwe tevlî xebatên çand û hunerê bûm. Piştre hêdî hêdî hişmendiyek çêbû, vê kir ku ez hez ji xebatê bikim û pê ve werim girêdan. Malbata min li dij vê bû, ji bo vê jî min ji wan vedişart."



### BI ŞOREŞÊ RE TÊKILIYA MIN A BI HUNERÊ RE ZÊDETIR BÛ

Tolhildan dibêje piştî Şoreşa Rojava ya 19'ê Tîrmehê meyla wî ya li ser çand û hunerê zêdetir bûye û di vê mijarê de hewcehiyên meztir derketine holê û wiha dewam kir, "Ji destpêka şoreşê ve çand û huner pir bipêş ket. Qada wê ya bandorkirinê berfireh bû. Derfetên perwerdehiyê zêde bûn. Bi vê derfet çêbûn ku çanda Kurdan baştir nas bikim. Di van xebatan de herî pir min hez dikir resman çêbikim. Jixwe bi çêkirina resman min dest bi xebatên çand û hunerê kir."
Gerîlayê HPG'ê Tolhildan behsa giringiya xebatên hunerê kir û got, "Hevrêyên pir hêja hebûn. Gelek keda Heval Delîl, heval Evdilsemet, Brûsk Hesekê di vê xebatê de heye. Herî pir hevrêyê ku bandor li min kirî Şehîd Delîl bû. Li sazê û gîtarê dixist, li gel vê, dengê wî jî zehf xweş bû. Bi moral û kelecaniya xwe hemû derdora xwe dilxweş dikir. Ji ber bandor û keda wî min navê wî li xwe kir. Saza min, gotina min, li bara wî çi qasî kêm bimîne jî min xwest xeyalên wî li vir pêk bînim.''

### MIN DIGOT QEY JIYANA GERÎLA TENÊ BI ÇEKÊ YE

Tolhildan diyar kir her ku çanda xwe nas kiriye zêdetir bi gel ve hatiye girêdan û di encama vê de 2014'an de tevlî nav gerîla bûye û got, "Cara pêşî dema ku hatim çiya min got qey derfet tine ku xebatên çand û hunerî werin geşkirin. Min digot qey jiyana gerîla tenê bi çekê sînordar e, lê dema ku hevalan gitar ji min re anîn, ji bo resman dema ku kaxez û qelem ji min re anîn, min fêhm kir ku PKK çi giringiyê dide xebatên çand û hunerê. Wê demê mirov fêhm dike, PKK an jî gerîla tenê ne bi şer dixwaze civaka azad ava bike, dixwaze bi pêgiribûna bi çand, huner, rêz û rêçikan dixwaze civakê ava bike. Bi vê hêza ku min ji hevrêyan girtî, zêdetir bi hunera xwe ve hatim girêdan."
Gerîlayê HPG'ê Tolhlildan destnîşan kir ku, armanca PKK'ê ew e ku 'dîroka winda zindî bike'' û got, "Her civak dîroka xwe bi rêyên cuda tîne zimên. Kurdan bi çîrok û dengbêjan dîroka xwe tîne ser zimên. PKK bi têkoşînê dixwze vê dîrokê zindî bike û ji bo vê têdikoşe. Çand û hunera li nav PKK'ê geş dibe jî mînak vê ya herî berbiçav e."

### GERÎLA XEYALÊN XWE PÊK TÎNE

Gerîlayê HPG'ê Tolhildan dibêje ku xeyala wî ya mezin ew e xebatên hevalên xwe yên ku demên cuda şehîd bûne, pêk bîne û got, "Ez dixwazim li nirxên ku Hozan Mizgîn, Hozan Dilovan, Şehîd Sefkan ava kirine xwedî derkevim û bi pêş ve bibim. Ev ne tenê daxwazek e, her wiha peywira min e jî."
Tolhildan ku li nav hemû dijwariya şer li Zapê doktoriyê dike, herî dawî got: "Her çendî kêm bimînim jî di qada çand û hunerê de dixwazim xwe pêş ve bibim. Dixwazim li bîranînên hevrêyên xwe yên şehîd xwedî derkevim û xeyalên wan bi hunera xwe nîşan bibim. Her gerîla bi xebata xwe ya bi xwestekê û li gel vê bi têkoşîna xwe xeyala xwe pêk tîne. Çiya qonaxeke girîng e.Ne tenê Kurd hemû civakên ku li azadiyê digerin li van çiyan dikarin xeyalên xwe pêk bînin."…*ANF*

## Li Kampa Serdemê pirtûkxane tê vekirin

**Idrîs HENAN**



Pirtûkxane; girîngtirîn nîşaneya pêşketina çandî û şaristanî ye. Hawûza dîrok, agahî û zanyariyê ye. Di nav refên xwe de agahiyên gewre dihewîne. Ji bo pevguhertina çandî û naskirina çandên dîtir, pirtûkxane xwedî rola bingehîn e. Pirtûkxane girîngiya xwe ji taybetmendiya erkên xwe yên xwezayî ku pêk tîne digire. Herî destpêkê de giyana mirovan perwerde dike. Dîrok û kişfên mirovahiyê diparêze. Ji şagirtên zanistê, lêkolîner û vekolîneran re, jêdera zanyariyê ye. Dîsa bi nîqaşên mirûdên xwe, navgîna civkabûyînê ye. Derfeta feqîran a bê pere ya xwendin û zanyariyê ye.

### WÊ XIZMETA FIKRÎ BIKE

Bi pêşniyara Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê û erêkirina Rêveberiya Kampa Serdem a koçberên Efrînê pirtûkxaneyek li Kampa Serdem tê vekirin. Li gorî ekîpa li ser vê projeya zanistî radiwestin; ji pêşketina mirovan û avakirina hişmendiya tendirust, wê ev pirtûkxane veguhere avahiyeke şaristanî û şaxekî çandî ya herî girîng.
Şêwekar Henîf Hemo di vê derbarê de ji rojnameya me re axivî û ev tişt anî ziman: Pirtûkxaneya Kampa Serdem wê ji şêniyên kampê û yên derve re xizmetên cuda yên fena (wêjeyî, zanistî, civaknasî, lêkolînerî, derûnî, ramyarî, zanyarî, bijîşkî,… hwd) pêşkêş bike. Hemo girîngiya pirtûkxaneyê jî wiha diyar dike: Çiqas pêşketin hebin, hemû jî bi riya çapemeniyên navxweyî û navneteweyî yên wergerandî ne ye. Ji ber vê yekê, pirtûkxane kuneya zanist û zanînê ye.

### PIRTÛKXANE JÊDETA ZANISTÊ YE

Henîf Hemo destnîşan kir: Ji ber vê girîngiya mezin a avakirina avahiyeke wisa a zanist û zanyariyê, Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê li Kampa Serdem pêşniyar kir ku pirtûkxaneyek ji şêniyên kampê û kesên ji derve re bê vekirin. Armanc ew e ku; nişteciyên kampê bi astên xwe yên cuda cuda bikaribin tîna xwe ya fikrî têr bikin û asta tehlîl û têgihaştina xwe pêş bixin. Ango wê ji hemûyan re bibe jêdera zanist û ramanê.
Hemo di berdewama nirxandina xwe ji rojnameya Ronahî re got: Her kes dizane ku şer bi çekan tê kirin. Lê beriya şerê çekan şerekî taybet ku mejiyan dirûxîne heye. Bi riya wî şerî jî serweriya li ser mejî tê kirin. Ji bo em nekevin xefka ragihandina dijber û neyên xapandin, gelekî giînge ku em civaka xwe ji van herdu cureyên şeran biparêzin. Hemo tekez dike ku; ancax bi riya xwendin û xwetêgihaştinê em vê xeta xweparastinê pêş bixin.

### BI HEZARAN PIRTÛK HENE

Derbarê pirtûkên wê li ser refên pirtûkxaneya Kampa Serdem cih bigirin de Hemo got: Wê bi hezaran pirtûkên cuda cuda (zanyarî, metamatîk, civaknasî, felsefe, dîrok, wêje, … hwd) li ser refan bên danîn. Hemo tekez dike ku heya vê kêliyê jimarek baş ji pirtûkan kom bûye û ev tişt eşkere kir: Hejmrek mezin ji pirtûkan diyarî ne. qismek din hatine kirîn.



### PIRTÛKXANE JI HER KESÎ RE VEKIRÎ YE

Henîf Hemo di nav gotinên xwe de bi bîr xist ku Rêveberiya Kampa Serdem piştgirî daye vê projeya Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê û ev tişt li gotinên xwe zêde kir: Ji bo avahiya pirtûkxaneyê, Rêveberiya Kampa Serdem odeyek hesinî (Karavan) diyarî me kir. Weke şêwekar û dîkorîst em ê refik, dîkor û resmên pêwîst amade bikin. Hemo dibêje: Ji bo ku rêjeya xwendekaran zêde bibe, em ê li dora pirtûkxaneyê gulistanekê ava bikin. Wê xwendevan bikaribin di heyameke ji xwendinê re guncaw de pirtûkên xwe bixwînin.
Şêwekar Henîf Hemo dawiyê de derbarê çawaniya dayîna pirtûkan û rêbazê birêvebirina pirtûkxaneyê de ev tişt got: Pirtûkxaneya Kampa Serdem ji her kesî re vekiriye. Hemû şêniyên kampê û kesên ji derve jî dikarin bên û pirtûkan bixwînin. Sîstema wê ya rêvebirinê jî wê bi nîqaşên Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê û endamên wê re di rojên pêş de zelaltir bibe.

## Derdê Hunerê



**Rotînda YETKÎNER**

Derfet û hêz tenê têrê nake ku hunerek têr û tijî bête avakirin. Ger usa ba wê li welatên bakurê Ewrupê hunera bê hepa bihatana afirandin, ji ber ku taybet li van welatan îmkanên bê dawî hene. Lê mixabin li van welata hunera resen zêde nîne.
Dîsa tenê bi xwstek û bi kedê jî hunera bê hepa naye afrandin, ji ber ku huner ne têne ji van pêdewiyan tê afrandin. Ger usa ba li welatên wek me din ava Şoreşê de an jî di tekoşeriya ji bindestî xwe xilaskirinê de we hunerek pêhepa bihata afrandin.
Qasê ku ez têgihiştime û pirtukên li ser hunerê nivisandî de tê ziman, huner; dive ji mejûye afirenê û zelal û ji taklîtên erzan dûr, mejûyên tijî fiki û proje û ne bin siya tu hezek an kesek da be tê afrandin.
Huner, di afrandina xwe de aîdê kesayetekê ye û li du afrandinê dibe anonîm an jî tê parvekirin bi civakê re. Di cepha me de, di vê warê de jî nakokiyek heye lê bawer dikim em ji hev tênagihêji lewra jî ev nakokî her berdewam dike. Çiye ev nakokî? Pir tê ziman, " huner ji bo civake ye an ji bo hunerêye?" ev hevok kokda şaşe. Lê ji ber ku li ser ve nerîne bi kurayî û li gor zagonên hunerê nehatiye rawestandin, ji ber wê jî hê jî rast nehatiye femkirin. Kesayet û takekesî nebe, huner nay afrandin lê ger tenê takekesî derkeve pêş ew dem huner jî nammîne li hole, têne popîlîzîm tê afrandin.
Huner di kîjan beşêde dibe bila bibe, despêke kesayete, yanî kesekê wê hunerê diafrîne. Ji ber wê jî em nikarin di warê hunerî de kesan wek kesên ku li cepha siyasetê bigrin dest û rexne bikin.
Dîsa huner ne ji bo xwesteka hin kesan an hin aliyan û li gor spariş nay afirandin, ger kesayet afiranêr be, wê li gor têgihiştina xwe ji buyer û îdolojîyan fez bigre û hunerê biafrîne.
Hunermed bi xwe nikare navê xwe bike hunermed an jî hêzek siyasi nikare rola hunerê bide alîgirên xwe, dive ew kesana ji aliyê beşek civakê bête pejrandin û erka hunerê bidin wê-wî.
Mixabin ev pîvanên hunerê hê nahatiye gel me. Ez ev sîh sale di cepa hunerê de li gor hêza xwe disekinim û tevlî bi sedan civînên nav huner! Bûme. Lê her car naverokên civînan, çûyina şev, dewet, konse û neçekirina DC û her waha tiştên ji naveroka hunerê durin. Yanî em hê negihiştine pola 2 yan.

# Welatiyên rojava ji başûr vedigerin

**Bi destpêkirina şerê navxweyî yê Sûriyê re gelek welatiyên Rojava jî ji ber êrîşên komên çete çûn başûrê Kurdistanê. Lê piştî ku hêzên Rojava êrîşên çeteyan têk birin û ewlehiya li Rojava saz kirin welatiyên Rojava careke din vedigerin. Heta niha hezar û 300 malbat ji başûr vegeriyan Rojava.**



Piştî têkbirina çeteyên DAIŞ'ê û avakirina ewlehiyê gelê Rojava yên ku koç kiribûn başûrê Kurdistanê careke din vedigerin ser axa xwe.
Welatiyên Rojava ku ji ber êrîşên çeteyan çibun başûrê Kurdistan careke din vedigerin rojavayê Kurdistanê. Heta niha nêzî hezar û 300 malbat vegeriyan rojava.
Bi destpêkirina şerê navxweyî yê Sûriyê re gelek welatiyên Rojava ji ber êrîşên çeteyan berê xwe dan Başûrê Kurdistanê.
Welatiyên rojava piştî ku ewlehî û aramiya li herêmê pêk hatiye vedigerin Rojava.
Welatiyê bi navê Ehmed Hisên Seîd ê ji Dirbesiyê ye û ev nêzî 2 sal li başûr e wiha got: "gelê rojavayê Kurdistanê ku ji ber êrîşên çeteyan derbasî başurê Kurdistanê bûn niha dixwazin vegerin cih û warê xwe. Êdî li rojava rewş arame. Ji xwe li Başûrê Kurdistanê di nav kampan de welatî ji ber ne başiya danûstandinê û zextên ku berpisên kampê li şêniyan dikirin gelek zehmetî dikşînin. ji ber wê gelek niştecihên kampan vedigerin Rojava."
Li ser mijarê Betûl Elî jî anî ziman ku êdî li rojava rewş aram buyê, ti sedemek nine ku li başurê Kurdistan bimînin.

### HEZAR Û 300 MALBAT VEGERÎN

Endamê Rêveber ê Buroya Têkiliyan ê deriyê Sêmalka Mihemed Xêr Bicus diyar kir ku ji meha borî ve zêdetirî hezar û 300 malbat vegerîn Rojava."…*ANHA*

# Heyva Sor a Kurd rojane 250 nexweşan derman dike




Navenda Tenduristiyê ya Heyva Sor a Kurd a taxa Seyf El-Dewle ya bajarê Reqayê tevî derfetên kêm rojane 250 nexweşan bê pere derman dike.
Navenda Tenduristiyê ya Heyva Sor a Kurd a taxa Seyf El-Dewle ya bajarê Reqayê xebatên tenduristiyê yên wekî derman û tedawîkirina bê pere dimeşîne.
Navend ji beşên nexweşiyên hundirîn, zarok, beşa destwerdana lezgîn û ambulansekê pêk tê.
Rojane navend 250 nexweşan ku piraniya wan zarok in, pêşwazî dike û tên dermankirin.
Endamê rêveber ê navendê Mehmûd Bozo destnîşan kir ku ew li gorî derfetên heyî di nexweşan pêşwazî dikin û wan derman dikin…*ANHA*

# Mazota zivistanê tê belavkirin




Li bajarê Kobanê û gundewarên wê ji bo ku pirsgirêkên mazota zivistanê dernekevin, Komîteya Sotemeniyê ya Kobanê mazotê li welatiyên belav dike.
Beriya heyvekê belavkirina mazotê dest pê kir, lê ji ber hin pirsgirêkan hate sekinandin û 8`ê meha Îlonê dîsa li Kobanê û gundewarên wê dest pê kir.
45 hezar kartên belavkirina mazotê li kantona Kobanê hatin belavkirin. Ji her kartekê re 600 lître mazot derdikeve, lê niha 400 lître tê belavkirin, piştre wê 200 litre jî were belavkirin.
Di vê derbarê de hevserokê muduriyeta sotemeniyê ya girêdayî Rêveberiya Xweser a Kobanê Nebîl Kecel wiha got: "Em ê heta 3 heyvan 400 lître li hemû welatiyan belav bikin, piştre ji bo ku pirsgirêk dernekevin, em ê 200 lîtreyên din belav bikin."
Mazot li Kobanê bi serîceyan diçe ber deriyê malan. Buhayê mazotê bi 55 lîreyên Sûriyê ye.
Li gorî komîteya sotmeniyê şêniyên gundên Kobanê jî dikarin werin gaziyan û mazota xwe werbigrin…*ANHA*

# Dewreya perwerdeya ji bo zimanê dayikê dest pê kir



Meclîsa Kongreya Star a Bajarê Til Temir a Kantona Hesekê dewreyek bi navê 'Zimanê dayikê hebûn e' vekir.
Meclîsa Kongreya Star bi armanca fêrbûna zimanê dayikê dewreyek bi navê 'Zimanê dayikê , hebûn e' li meclisa Kongreya Star vekirin, dewre ji 12 endam û rêveberiyên Kongreya Star pêk tê.
Endama Kongreya Star Dilşa Yûnis diyar kir ku ev dewre bi xwesteka wan hate vekirin û got, "Em îro bi kêfxweşî dewreya zimanê kurdî dibînin. Dewreya me 2 saetan dewam dike, em dixwazin fêrî zimanê dayikê bibin û xwedî li nasnameya xwe derkevin. Di kar û xebatê me de xwendin pêwîst e lewma em jî bi armanca xurtkirina kar em hatine fêrî zimanê dayikê bibin."
Endama Rêveberiya Pêwendiyên Diplomasiyê ya Kongreya Star Eliya Oglo ku ji pêkhateyên Ereb e wiha got: "Mirov gerek despêkê xwedî li zimanê dayikê derkeve, Kurd zimanê xwe nas bike, Ereb û Ermenî zimanê xwe nas bikin. Her kes divê di despêkê de li zimanê xwe xwedî derkeve paşê fêrî zimanê din bibe. Ez zimanê xwe yê Erebî nas dikim û kêfxweş im ku tevlî vê dewrê bûm û fêrî zimanê Kurdî dibim."
Eliyayê wiha dewam kir: "Zimanê dayikê nasname ye û pişaftina zimanê dayikê pişaftina wî neteweyî ye, pêwîste mirov li hember pişaftinê têbikoşe û xwedî li nasnameya xwe derkeve."
Eliya Oglo axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ez bang li hemû netewan dikim ku hişyar bin û xwedî li nasnameya xwe derkevin. Gelek polîtîkayên qirêj bi armanca pişaftina zimanê dayikê tê meşandin. Li hember van polîtîkayan divê em hişyar bin û xwedî li hebûna xwe derkevin."
Dewreya bi navê 'Zimanê dayikê, hebûn e 'wê mehekê dewam bike…*JINNEWS*

RAMANÊ RÊBERTIYÊ



## Hevjiyana Azad -1-

**Abdulah Ocalan**

Mirov heta li têkiliyên di navbera jin û mêran de serwext nebe, ne dikare li ti pirsgirêka civakî bi temamî serwext bibe, ne jî dikare ji hev derxe. Di bingehê pirsgirêkên civakî de pirsgirêk û problematîkên di têkiliyên jin û mêran de hene. Saziya zewacê ya bi awayekî yekalî di civaka hiyarerşîk û civaka şaristaniyê de li ser jinê hat ferzkirin, serweriya mêr pirralî ava kir û bi vê re belkî jî di xwezayê de bi qasî ku ti zindî û ruhberî nedîtî, hîmê saziyeke koletî û hewcebûnê hat danîn ku bi tenê xweserî civaka mirov e. Statuya pêşî ya civakîbûn, çînayetî û netewetiya serdest-bindest, timî li ser vî bingehî ava dibe. Di binê her şer û pevçûnê de jî ev rastî heye. Tişta ku dîroka şaristaniyê û qonaxa wê ya herî dawî modernîteya kapîtalîst herî zêde ser wê girtiye, ew berevajî kiriye û neyênî nîşan daye, rastiya der barê statuya koletiya jinê ya li ser vî bingehî ye. Jina ku di civaka şaristaniyê de bi şeytên re wekhev tê dîtin, di sosyolojiya modernîteyê de kesayeta herî sernerm a konformîzmê û diya zarokan a karkertiya malê ya bêheqdest e.
Diviyabû serwextbûna li tevahiya naverok û şêweyên asta koletiyê ya ku bi hezarê salan bi aqil û destê mêrê mêtinkar û zordest ketiye jiyana jinê, bibûya gava pêşî ya sosyolojiya rastiyan. Ji ber ku şêweyê mêtinkarî û koletiya di vê qadê de prototîpa tevahiya şêwegirtinên mêtinkarî û koletiya civakî ye. Berevajiyê vê jî rast e. Têkoşîna wekhevî û azadiyê û asta destketiyên vê têkoşînê li dijî mêtinkarî û koletiya xistine nava jiyana jinê, bingehê têkoşîna wekhevî û azadiya li dijî mêtinkarî û koletiya di her qada civakî de ye. Têkoşîna azadî û wekheviyê di dîroka şaristaniyê û modernîteya kapîtalîst de li ser bingehekî rast pêş nakeve û rê li ber serketineke bi hêz venake, sedema bingehîn a vê yekê ew e, zêhniyet û saziyên mêtinkarî û koletiya şêwe danê û xistine nava jiyana jinê baş nehatiye fêhmkirin û têkoşîna li dijî wan weke bingeh nehatiye dîtin. Çawa ku dibêjin, masî ji serî ve genî dibe. Wexta ku bingeh rast û durist neyê danîn, avahiya were lêkirin wê di lerzeke piçûk de xira bibe. Di dîrokê û roja me ya îro de bêhejmar mînakên vê rastiyê hene.
Kengî mirov hewl bide pirsgirêkên civakî çareser bike, divê mirov hûrûkûr li ser diyardeya jinê bifikire, ji bo hewldanên wekhevî û azadiyê jiyana jinê bike çavkanî û ev yek divê hem bingehê rêbaza lêkolînê û hem jî bingehê hewldanên zanistî, exlaqî û estetîk ên hevgirtî be. Rêbazeke lêkolînê ya rastiya jinê bêpar, têkoşîneke azadî û wekheviyê ya jinê nexe navenda xwe, nikare bigihîje heqîqetê, nikare azadî û wekheviyê pêk bîne.
Ji bo jiyaneke rast, ya bingeh ew e, divê mirov beriya her tiştî jinê terîf bike û rola wê ya di nava jiyana civakî de diyar bike. Em vî hukmê xwe ji bo xisletên biyolojîk û statuya civakî ya jinê nadin. Têgîna jinê weke hebûn girîng e. Mirov çiqasî jinê terîf bike, terîfkirina mêr jî ewqasî pêkan dibe. Em bi mêr nikarin dest pê bikin, jiyan û jinê rast terîf bikin. Hebûna xwezayî ya jinê di statuyeke navendîtir de ye. Ji aliyê biyolojîk ve jî ev wisa ye. Civaka serwer a mêr, statuya jinê têra xwe piçûk xistiye û tine hesibandiye, lê ev, ji bo serwextbûna me ya li rastiya jinê divê nebe asteng. Xwezaya jiyanê zêdetir bi jinê re têkildar e. Herçiqasî jin gelekî ji jiyana civakî hatibe dûrkirin jî dîsa ev rastî bi vî rengî ye, û nabe şaşî, berevajî piştrast dike. Ya rastî, zilam bi hêza xwe ya zordar û tineker di şexsê jinê de êrîşî jiyanê dike. Tinekerî û dijminatiya jiyanê ya mêr weke serwerê civakî têkiliya xwe ji nêz ve bi rastiya wî ya civakî re heye.



# QSD'ê sê jinên Êzidî rizgar kir

**Di 3'ê Tebaxa 2014'an de çeteyên DAÎŞ'ê êrîşî Şengalê kir. Di encama êrîşê de bi hezaran jin revandin. Heta niha hê jî aqubeta gelek jinan nayê zanîn. Hêzên Sûriya Demokratîk 3 jinên Êzidî yên din ji destên DAIŞ'ê rizgar kir. Jinên ku hatin rizgarkirin li Xanesorê ji aliyê TAJÊ ve radestî malbatên wan hatin kirin.**



3 jinên Êzidî ji aliyê QSD'ê ve ji destên çeteyên DAÎŞ'ê hatin rizgarkirin. Jinên ku hatin rizgarkirin li Xanesorê ji aliyê TAJÊ ve radestî malbatên wan hatin kirin.
Di 3'ê Tebaxa 2014'an de DAÎŞ'ê êrîşî Şengalê kir. Di encama êrîşê de bi hezaran jin ji aliyê DAÎŞ'ê de hatin revandin. 3 jinên Êzidî ji aliyê QSD'ê ve ji destên çeteyên DAÎŞ'ê hatin rizgarkirin. Jinên ku hatin rizgarkirin li Xanesorê ji aliyê TAJÊ ve radestî malbatên wan hatin kirin.
Jina bi navê Mulike Xidir ya 30 salî ku ji destên çeteyên DAÎŞ'ê hat rizgar kirin got: "Çeteyên DAÎŞ'ê di 15'ê Tebaxê de ketin gundê me yê bi navê Koçoyê. Dema ku ketin gund me hemû li qadekê kom kirin. Piştre gelek jin revandin. Min qet bawer nedikir ku ez ê ji destên wan rizgar bibim. Lê QSD'ê em rizgar kirin. Em gelek spas dikin. Ez gelekî kêfxweş im ku ji çeteyan hatim rizgarkirin."

### EZ BI HÊVÎ ME HEMÛ JIN RIZGAR BIBIN

Jina bi navê Feyruz Hasim a 17 salî ku ew jî ji çeteyan hat rizgarkirin got: "Dema ku DAÎŞ ket Şengalê em gelekî tirsiyan. Herkesî digot mêran dikujin jinan jî direvînin. Dema ku çeteyan me revandin bi zorê mislimantî li ser me ferz dikirin. Gelek eziyet me kişand. Çend caran min hewl da ku birevim lê dîsa min girtin. Niha gelekî kêfxweş im ku rizgar bûm. Ez gelekî spasiya QSD'ê dikim. Ez hêvî dikim ku hemû jinê di destên çeteyên DAÎŞ'ê de bên rizgarkirin."

### DAXWAZA MIN EZ DAYÎKA XWE BIBÎNIM

Keça 12 salî Înas Nasir Reşo jî ji ber ku ji destên DAÎŞ'ê hat rizgarkirin kêfxweşiya xwe anî ziman û got: "DAÎŞ'ê dema ku me revand ez ji dayika min qut kir. Niha daxwaza min a herî mezin ew e ku ez dayika xwe bibînim."
Li ser navê Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ) Nafiye Mêşo axivî û got: "Em gelek kêfxweş in ku 3 jinên Êzidî ji destên çeteyan hatin rizgarkirin. Em spasiyê xwe ji QSD'ê re pêşkeş dikin."

# Hemû malabata xwe winda kir lê hêviyên xwe winda nekir



**Melek DEMÎRTAŞ**

Ji destpêka şoreşa Sûriyê û heye roja îro ji sedema şer û pêvçûnan, êrîşên DAIŞ'ê û binpêkirinên mirovahiyê jin rastî hemû cureyên tundî, koçberî û tacizê tên û roj bi roj êş zêde dibe ev ji bilî rewşa tenduristiyê û veguhestinê ji bo dermankirinê. Yek ji van sedan jinan jî Huda ye ku tevî hemû zehmetî û êş ku ev malabata wê jê bir, lê hîn li berxwe dide û hêviyên xwe winda nekirye û roja xwe bi xwendina pirtûkan derbas dike.

### DI ŞEVEK TARÎDE MALBATA XWE WINDA KIR

Çîrok û êşên jinên Sûriyê malek ji maladin cudaye, yek ji qurbaniyên vî şerî jî jina Ereb a bi navê Huda El-Ebdelah bi temenê 35 salî dayika 3 zarokan ji Dêrazorê taxa Salihiyê ye Huda serpêhatiya xwe him bi çavên tijî rondik û him bi hêvî wiha vegot: "Beriya şoreşê malak minî biçûk hebû û madiya em dihate qedandin, lê piştî êrîşên çeteyên DAIŞ'ê li Dêrazorê. Û dorpêç kirin, şevek ji şevên tarî ji hêla belafiran mala me hate bombarandin, di encama êrîşa hewayî de qîz, lawik û hevjînê min jiyana xwe ji dest dan û ez bi giranî birîndarbû; di emcamê de nema karîbûm li û tevgerê bikim."

### JI BER ÊRÎŞAN HER PENABER BÛN

Huda wiha pêde çû: "Piştî vê bûyerê birayê min anî mala xwe, tevî ku birayê min di milê madî de belengaze jî, lê kesên xêrxwaz hîn hene û alîkariya wê dikirin. Da ku min derman bikin em çûne Şamê, lê rêwîtiya me gelek zehmet bû, ji ber ku min nikare tevger bikim birayê min dirahişte û min dibir. Piştî ku bijîjk tendrustiya min kontrolkir û emelyat kirin, emeliyat ji % 50 serketî bû, piştî wê êdî min karîbûm ku ez rûnim."
Huda wiha Çîroka xwe dewam kir: "Piştî wê bi birayê xwere vegeriyam mala wî, jiber ku tu cih û warê min nebû, her wiha kes nebû ku li mi miqatebe. Lê ji ber ku roj bi roj dorpêç û bombebaran zêdebûn, birayê min biryar girt ku ew malabt, dayika bi temen mezin û ez ji Dêrazorê birevin û dev ji xaniyê xwe berdin. Me berê xwe da Reqayê, lê ji ber kêm derman û têdaviya min ku bijîjk ser berdewamiya tedaviyê tekezkiribû li wir tenê sê mehan man. Da ku dermankirina xwe temem bikin me berê xwe da bajarê Hesekê û li nexweşxaniyê tedavî kir lê, ji sedemên nebûna madî tenê 10 roja li nexwşxaneyê man. Piştre em hatin Qamişlo û xaniyek li taxa Zeytuniyê kirêkir, bariyê min da ku pêwîstiyên malê û dermanên min peyda bike bi şev û roj dixebitî."

### ÊŞ SER ÊŞÊ DİBÛ Û HÊVİYÊN ME ZÊDE DİBÛ


Malbata Huda rastî gelek zehmetiyan hat, di şevekê de Huda zehif êşiya û birayê wê ew rakir nexweşxaneya dewletê ya li Qamişlo, li wir rêjîm birayê wê girtin, çimkî leşkeriya neçariya rêjîmê nekiribû. Dayîka Huda xebre da qîza xwe ya li Dêrazorê dimîne ku werê gel wan da ku alîkariya xwişka xwe bike. wiha ew qîz dev ji mal û zarokên xwe berda û hate alîkariya xweşka xweyî nexwşa bike, hîn xêrxwaz li devaran hene ku li gorî derfetên xwe alîkariya wan madî û derman kirin, lê ev du salin ku rewşa Huda û malbata wê wihaye."
Dayîka Huda ya binavê Cemîla Ilyas ser êş û azarên ku kişandin bi çavên tijî rondike wiha vegot: "Di bûyerê û şerê ku li Dêrazorê çêbû me gelek ziyana canî û madî jî dît, her wiha qîzamin bi giranî birîndarbû. Ku rojana rojên me bi êş û kelem derbas dibe, taybet piştî girtina lawikê min ku wê malabt bi rêvedibir û alîkariya xweşka xwe dikr, jiber ku ez bi temen mezinim nexweşim, min gazî keça xweyî Dêrazorê kir. Em rastî zehmetiyên jiyanî jî wekî kêmbûna avê jî tên, lê em bi bawerî û vîna xwe van hemû zehmetiya derbas dikin."

### HEMÛ BAR SER MİLÊ MİN MA



Rîm Ebdelah xwişka Huda wiha got: "Malak minî biçûk ez û hevjînê xwe tê de jiyan dikir, lê piştî êrîşa hewayî hin malên me jî ziyan dîtin, lê me dev ji malê xwe neqeriya ji ber ku tu cihêdin nîne ku em herinê. Lê piştî birîndariya xweşka min, ku nema karîbû tevger bike û gelek ji malbata me bûne qurbanê vê êrîşê. Li ser banga dayîka xwe ez hatim Qamişlo gel dayîk û xweşka xweyî nexweş ku nikare tevger bike, da ku ez alîkariya wan bikim, min dev ji mal û zarokên xwe qeriya û heye niha ez tiştekî agahiyekê ser wan nizanim. Rastî ji ber kêm derfetên madî malabat û bi taybet xweşka min ji ber kêm derman her ji ber birînê xwe êş û azaran dikşîne."
Hevjîna birayê Huda Newal Hisên jî ev tiş anî ziman û got: "8 zarokên min hene, beriya ku hevjînê min ji hêla rêjîmê bê girtin wê malab xwedî û xweşka xwe derman dikir, lê piştî wê ev hemû bar kete ser milê min rastî jî rewşek pir giran û zehmete jiyan dikin. Ku rojane zarokên min diçin bazara Hala a giştî da ku bixebitin û alîkariya malê bikin. her wiha zehmetiya ku em rastî wê tên jî kêmbûna avê ye ku ev du min av nayê."
Di vî şer û pevçûnê yê herî ziyan dît jin û zarok ne, ew rastî hemû cûreyên êş û zehmetiyê hatin; tvî wiha jî her heviyên xwe winda nekirin ji ber ku her çavên wan bendewariya jiyanek aştî bû."

# Projeyên Bîroya jin a Şaredariya giştî



**Ferîşte NEZÎR**

Rêvebira Bîroya jin a Şaredariya Giştî Raniya Pîco da zanîn ku ji destpêka şoreşa Rojava û Bakurê Sûriyê bi armanca xizmetguzariya gel şaredarî hatin vekirin û wiha got: "Ji ber ku sîstema me hevserokatiye û xwesrtiya jin jî heye di her şaredariyekê de bîroya jin hate vekirin. Ku jin di van bîroyan de ji bo jin û civakê jî rolek mezin lîstin, her wiha karê jin di şaredariyê de ji nêzve şopandin û rêxstinkir, her wiha perwedeyên rêxistinî û xwesertî jî di hatin kirin û pirsgirêkên heyeî di riya wan civîn û perwerdeyan de çareser di kirin. Di heman demê de projeyên taybet bi jinê bi alîkariya şaredriyaê û Desteya wê hatin avakirin."
Raniya bal kişand ser projeyên ku ahtine pêk anîn û wiha dewam kir: "Hemû jin bi yek dest û helwest dixebitin, armanca me ji bîroya jin û projeyên taybet bi jinê, ku em jibo wna derftên kar avabijkin. Projeyên ku ahtine pêk anşn jî evin. (Hola werzîşê taybet bi jinê, du bexçeyên zarokan yek bi navê Ş. Emîne li taxa Kornîş ku zarokên ji temenê 7 mehî heye 3 salî pêşwazî dikin û yadin jî bi navê Awaz li taxa Xerbî ku zarokên temenê 3 salî heye 5 salî. armanc ji van projeyan ku jinên di saziyan de dixebitin alîkariya wan bikin û zarokan bi rengeî baş bêne perwerdekirin, her wiha ku jin werzîşê bi rehetî karibe bike di heman demê de pêşdikeviin û derfetên kar avadikin."Raniya diyar kir ku ji bo demên pêş projeyên wan yên nû jî hene û wiha got: "Projeya şûştina beran heye, lê hîn di lêkolînê deye. Û wiha bi dawî kir: "Ji bo ku kar baş bi rêve biçe û agahdariya me ji hemû xebatî hebe, tekêliya me bi bi hemû bîroyên şarederiyê di kantona qamişo de heye, bi armanc açalakirna bîroya jinê di her mehê de bi wan re civîn tê çêkirin û di wan civînan de pirsgirêk, pêşniyar û proje têne nîqaşkirin û li ser vê bingehê raporên xweyî mehane radestî Bîroya jin a Desteyê dikin."

